



XEWNEKE POLÎTİK: ÇÎROKA CEMÎL SAÎB *DI XEW DE*

Sinan ÇAKAR

A Political Story: Cemil Saib's *Le Xewma* (In Sleep) Politik Bir Öykü: Cemil Saib'in *Di Xew De* (Uykuda) Adlı Öyküsü

Sinan ÇAKAR

ORCID: 0000-0002-1088-5995 | sinancakar@yyu.edu.tr
Dr., Department of Kurdish Language and Literature, Faculty of Letters, Van Yüzüncü Yıl University, Türkiye.

Citation/Jêgir/Atrif:

Çakar, S. (2024). Xewneke polîtik: Çîroka Cemil Saib Di Xew De. Kurdiyat (10), 143-155. DOI: 10.55118/kurdiyat.1589494

Article Types/Cureyê Gotarê/Makale Türü:

Research Article/Gotara Vekolinê/Araştırma Makalesi

Received/Dema Hatînê/Geliş Tarihi: 21.11.2024

Accepted/Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi: 26.12.2024

Publication Date/Dema Weşandinê/Yayın Tarihi: 30.12.2024

Peer-Review/Hekemtî/Hakemlik:

Double anonymized-Two External/Cot Nenas-Du ji derve/ Çift Taraflı
Kör Hakemlik-İki hakem

Plagiarism Checks/Kontrola Întihalê/Benzerlik Kontrolü:

This article has been scanned by iThenticate plagiarism website./
Ev gotar di malpera întihalê ya iThenticate ra hatiye derbaskirin./ Bu makale iThenticate adlı intihal sitesinde taranmıştır.

Ethical Statement/Beyana Etîk/Etik Beyanı:

It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited./ Hatîye beyankirin ku di pêkanin û nivîsîna vê xebatê de hemû rêzîkên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin./ Bu çalışma yapılırken ve yazılırken bilimsel ve etik ilkelere uyulduğu ve kullanılan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduğu beyan edilir.

Conflicts of Interest/Nakokiyên Berjewendiyên/Çıkar Çatışması:

There is no conflict of interest between the author and any parties in the article./ Di gotarê de li navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye./ Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.

Grant Support/Alîkariya Darayî/Maddî Destek:

The author acknowledge that they received no external funding in support of this research./ Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolinê ti fonên derveyî wernegirtine./ Yazar, bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

Copyright & License/Mafê Telifê & Destûr/Telif Hakkı & Lisanslama:

Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0./ Nivîskar li jer lisansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin./ Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.

Kurte

Xewn, di jiyana mirovan de û hema bêje di nava hemû dîn û çandên cur bi cur de ciyekî xwe yê taybet heye. Pêşeroja mirovayetiye bigire heta roja îro, di jiyana mirovan de bibandoreke mezin xwe daye der. Gelek kesan li ser xewnê serê xwe êşandine û herweha gelek wate jî jê derxistine. Ji bona vê termê gelek pirtûk hatine nivîsîn û di rêya şirovekirina xewnan de mirovên taybet derketine holê û ev mesele an jî ev babet jî xwe re kirine mesele û meslek. Zêdetir jî ji hêla dînî û psîkolojîk ve gelek nihêrînên cuda derketine holê. Vê termê heman demê bandor li edebiyatê kiriye û di edebiyata cihanê de cîyê xwe girtiye. Rengvedana xewnan di edebiyatê de caran weke bertekekê û bi helwest û mebesteke polîtîk hatine nivîsîn. Di edebiyata kurdî de jî metnên bi vî awayî hatine nivîsîn. Yek ji van metnan jî çîroka *Di Xew De* (Le Xewma) ya Cemil Saib e. Nivîskar ji bo rexne û hilsengandina serdemekê dîrokî xewnê weku amûrekî bikartîne. Ev xebat *Di Xew de* ya Cemil Saibî di çarçoveya bertekeke polîtîk de analiz dîke û hildisengîne.

Peyvên Sereke: Çîrok, Xewn, Şêx Mehmûd Berzencî, Di xew de, Le xewma, Cemil Saib.

Abstract

Dreams have an important place in the daily lives of people and in this respect, we can say that they have gained a unique place in all cultures and beliefs. Since time immemorial, dreams have exerted a distinctive influence on people's lives. Many people have pondered the concept of dream and derived a lot of meaning from it. Books have been written to explain this concept, and various individuals have come to the fore for the interpretation of dreams and have made this job their profession. Different perspectives and interpretations have emerged on the concept of dream, particularly within religious and psychological context. As a concept, the dream has also influenced literature and has gained a place in world literature. In literary texts, the dream has sometimes emerged as a political reaction, serving a purpose in this direction. Kurdish literature also contains texts of this kind. One of these is Cemil Saib's short story *Le Xewma* (In Sleep). In this story, Cemil Saib reveals a historical period through the dream method in a critical and political manner. In this study, this particular story of Saib has been analysed within the framework of political reaction, employing a critical and analytical approach.

Keywords: Story, Dream, Şêx Mehmûd Berzencî, Le xewma, Di xew de, Cemil Saib.

Özet

Rüya insanların günlük yaşamında önemli bir yere sahiptir ve bu yönüyle diyebiliriz ki tüm kültür ve inançlarda kendine has bir yer edinmiştir. Geçmişten bu yana insanların yaşamına kendine özgü etkilerde bulunmuştur. Birçok insan rüya kavramına kafa yormuş ve ondan çokça anlam çıkarmıştır. Bu kavramın açıklanması için kitaplar yazılmış, rüyaların yorumlanması için de farklı insanlar ön plana çıkmış ve bu işi kendilerine meslek edinmişlerdir. Rüya kavramı hususunda özellikle dini ve psikolojik açıdan farklı bakış açıları ve anlamlandırmalar ortaya çıkmıştır. Rüya kavram olarak edebiyata da etki etmiş ve dünya edebiyatında yer edinmiştir. Edebi metinlerde ise rüya, kimi zaman politik bir tepki olarak ortaya çıkmış ve bu yönde bir amaç gütmüştür. Kürt edebiyatında da bu türden metinler görülmektedir. Bunlardan biri de Cemil Saib'in *Di Xew De* (Uykuda) adlı öyküsüdür. Cemil Saib bu öyküsünde rüyayı tarihsel bir dönemi; eleştirel ve politik bir tutumla irdelemenin aracı olarak kullanmaktadır. Bu çalışmada Saib'in anılan öyküsü, politik tepki çerçevesinde eleştirel ve çözümleyici bir yaklaşımla incelenmektedir.

Anahtar Kelimeler: Öykü, Rüya, Şêx Mehmûd Berzencî, Di xew de, Le xewma, Cemil Saib.

Destpêk

Xewn di jiyana mirovan de cihekî giring digire ku hem li ser qada kesayatiyê hem jî civakî de xwedî bandoreke piralî ye. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku xewn di destpêkê de wekî têgiheke takekesî bê famkirin jî pişt re bi têkildarbûna xwe dikeve çarçoveyê berfireh. Ew tiştta ku mirov di dema nivîstîna de dibîne re wek xewn hatiye binavkirin (Doskî, 2006: 11). Di zimanê erebî de jî bo xewnên baş rûya, ji bo xewnên nexweş jî hulm tê gotin. Rûya rehmanî, hulm şeytanî ne (Çelebi, 2008: 306). Di dîrokê de xewna herî binavûdeng ya ku hatiye tomarkirin xewna Yusuf pexember e. Yusuf pexember bi şîrovekirina xewna Firewn ji zindanê azad dibe û welatê Misrê ji xelayê jî diparêze (Cayce, 1998: 14). Dîsa di Kur'ana pîroz de Yusuf pexember xewna xwe ji bavê xwe Yaqûb pexember re dibêje û Yaqûb pexember bi şîrovekirina xewna wî dixwaze wî ji bela û musîbetan biparêze (Yûsuf 12/4-6).

Feylesofê Yewnanî Platon li ser xewnan wiha dibêje “xewn dengê wijdana me ne, hewce ye mirov guhdarî bide vî dengî û riayetê wê bike”. Lê berevajiyê Platon Arîsto xewnan tiştên tesadufî û bêwate dibîne (vgz. Cayce, 1998: 15). Fîkr û ramanên li ser xewnan wisa dixuyê ku ji mahiyeta xewnan dûr nîne. Çimkî xewn ji siruştiya xwe jî tê famkirin ku hem girêdayî jiyana rojanê ye û bi mantiq û qeydeyên wî tîr şîrovekirin û hem jî ev yeka wekî teqez naye sînorkirin. Loma di nav wê de binhiş, mêj, amanc û xeyalên merivan tîkildarîya wê zêde dike. Di taybetiya nezaniyê jî xewnan dikişîne qadeke din. Ev jî wekî qada çand e ku li ser şîrovekirina xewnan û mereqa paşerojê ava dibe. Ji bona vê yekê falzan û remlvan derketine û xewn şîrove kirine. Pêkhatin û şîrovekirina xewnan ji teologan bigire heta psîkanalîst û feylesofan re jî bûye meraq. Psîkanalîsttan xewn, ji bo çareserîkirina pirsgirekên dêrûnî, teologan ji aliyê dînî, û feylesofan jî ji bona zelalkirina raborî û dahatûya mirovan, wek elametekê dîtine (Osmanoğlu, 2017: 2). Di dîrokê de gelek caran kesên ku xewn şîrove kirine wek mirovên pîroz hatine dîtine. Doskî dîyar dike ku li ser perestgehekê dînî di derbarê şîrovekirina xewnan de weha hatiye nivîsîn: “ez xewnan şîrove dikim, û min ji layê xwedavendan ve destûr heye ku vê çendê rabibim” (2006: 11).

Piştî serdemekê zedetîr jî piştî sedsala bîstan psîkanalîstan ji hêla dêrûniyê ve xewn şîrovekirine û ev cure şîrovekirin jî piranî bi pîvanên Freud ve şikil girtiye. Li gorî Freud (1856-1939) xewn pêkhatina arezûyên mirovan in. Mirov di jiyana de bi hin kêşe û meseleyan re rûbirû dimîne û car dibin ku di van meseleyên xwe de çareserîyekê pêk nayîne û gelek caran jî serkeftinekê çênabe. Ev kêşe û meseleyên vî awayî bandorê li xewna wan dike û meseleyên ku nehatine çareserîkirin di xewnê de li gorî xesteka wan çareser dibin (Freud, 2018: 19).

Xewn herweha di metnên edebî de jî cih girtiye. Pêwendîya edebiyat û xewnê di serdemên modern û postmodern de bûye mijara metnên edebî. Nivîskaran ji bona derbirîna hin meseleyên takekesî û civakî motîfên xewnê bikaranîne. Bi rêya vê yekê jî hin tiştên nepenî bi sembolen xewnan ve dane dîyarkirin (Üstün Kaya, 2021:452). Metnên xewnî gelek caran ji bona rexnekirina serdemekî yan jî desthilatdarîyekê hatine honandin. Bîrokrasî, karbidestî yan desthilatdarî gelek aliyan ve di edebiyatê de cîyê xwe girtiye. Rişwet, zilm û zordarî, helwestên nelirê û hukmên bêkanûnî yên karbidestan, ji hêla nivîskaran ve hatine gengeşîkirin û rexnekirin (Tosun, 2020: 359). Li gorî Pospelov hemû berhemên edebî jî bo armancekê tîr nivîsîn (2014: 205). Ji ber vê

yekê ye ku metnên honandî ne bi tesadûfî bi mebesteke dîyarkirî ve tînan afirandin. Xewn gelek caran remzên dahatûyê şîrove dike û dahatûyê rave dike. Da ku mirov bikare hêmaya metneke edebî peyda bike divê di serî de mirov mebesta nivîskar ya nivîsandinê dîyar bike. Lewra metna edebî di encama helwesta nivîskar ya hundirîn pêk tê (Çıkla, Kuran, 2021: 68-69). Li gorî Necîp Tosun di afirandina metnekî edebî de divê mirov jîyana nivîskar jî berçav bigire. Bandora jiyana nivîskar her wiha bandorê metna wî jî dike. Ji ber vê yekê jî serpêhatî, şahidî, fikir û bawerî û helwesta nivîskar bandorê metnê dike. Tosun, dibêje ku “berhema hûnerî ji îdeolojîya nivîskar dûr/qut nabe” (2020: 99-100).

Em vê cureya nivîsê di edebîyata tirkî de jî dibînin. Yek ji van ji aliyê Ziya Paşa ya din jî ji aliyê Namîk Kemal ve hatiye nivîsîn. Ziya Paşa di sala 1869an de li Londrayê di rojnameya *Hurriyetê* de bi navê “Rûya” metnekî diweşîne. Ev metn di vê rojnameya navborî de, di hejmarên 68 û 69an de derdîçe. Dîsa di vê serdemê de metneke wî cureyî jî ji aliyê Namîk Kemal ve hatiye nivîsîn. Li gorî çavkanîyan Namîk Kemal ev metn di sala 1875an de li Magosayê nivîsiye (Demir, 2022: 12). Ziya Paşa di vê metna xwe de bi awayekî satîrîk desthilatîya sadrazam Mehmet Emin Ali Paşa rexne dike (Tek, 2017: 232). Ev herdu metn di serdema xwe de li hemberî desthilatdarîya serdemê hatine nivîsîn. Ji metneke edebî wêdetir bi gilî û gazindeyên nivîskaran pêk hatine. Lêkoler Metin Kayahan Özgül van metnan weke metnên siyasî pênasê dike. Li gorî Özgül, ev metnên navhatî di vê serdemê de bi mebesteke polîtîk hatine nivîsîn (1989: 21). Serdema nivîsîna metna Cemîl Saîb jî dikeve piştî van metnên navborî. Ger em rewşa serdemê jî binêrin em dibînin ku di vê serdemê de Silêmanî jî di nava sînore Împeratoriya Osmanîyan de ye. Ji ber vê yekê jî em dikarin bibêjin Cemîl Saîb jî ji vê cureya nivîsê haydar e. Lewra li ser vê esasê rexneyên xwe bi rêya metneke çîrokê anîne ziman. Cemîl Saîb di dewra Osmanîyan de jîyaye û îhtîmaleke mezin e ku haya wî wî cureya rexneyê heye. Haşîm Ahmetzade îddîa dike ku çîroka Cemîl Saîb îlhama xwe ji metneke tirkî wergirtîye û ev metneke xewnî ye û di sala 1909an de li Bexdayê bi zimanê erebî hatiye wergêrandin. Li gorî Ahmetzade çîroka Cemîl Saîb ji gelek aliyên teknîkî û tematîk ve dişibe vê metna navhatî. Ne tenê ev metn, Ahmetzade dîyar dike ku çîroka Cemîl Saîb di heman demê de dişibe kurteçîroka nivîskarê tirk ya Celal Nuri. Celal Nuri ev metna xwe bi sernavê “Cenette Bir Yolculuk” di sala 1903an de daye weşandin (2004: 194).

Nimûneyên metnên xewnî di edebîyata kurdî de jî tînan dîtin. Destana Memê Alan yek ji van metnan e. Di destanê de ji Mem re eyan dibe ku; Mem dê bi xwarina hinara jehrkirî û Zîna Zêdan jî dê piştî heft rojan bimire. Ev bûyer heman wekî Memî di xewnê de dîtiye pêk tê (Lescot, 2020: 139-140). Dîsa di çîroka Osman Sebrî (1905-1993) ya “Li Goristaneke Amedê” de lehengê çîrokê ji welêt dûr e û di hesreta welêt û bêriya rojên berê dike. “Kela gihana welêt...kela gihana welêt” (r.35). Ev hevokên hanê dêrûnî û naçarîya nivîskar didin der. Lê em di çîrokê de jê hay dibin ku çûna welêt ne mimkune. Em ji metna çîrokê jê derdixin ku lehengê çîrokê nivîskar bixwe ye. Nivîskar ji ber hin sedemên polîtîk ji welat sirgûn bûye û ji derveyî welat dijî. Ew xwesteka xwe ya çûna welêt bi riya xewnê bi cî tîne. Ew di xewnê de bask dike û tê li Amedê li ber goristaneke dadikeve jêr. Li goristanê bi gelek kesayetiyên payebilind yê kurdan û hin mirovên xwe ji nêz ve dibîne u bi wan re diaxive. Li vir dema em li gor Freud binerin arezûya mirov derdikeve pêşberî me. Lewra lehengê çîrokê astengiya tê de û xwesteka xwe ancax dikare bi riya xewnê pêk bîne.

1. Rewşa Sîyasî

Piştî t êkçûna dewleta Osmanî bajarê Silêmanîyê û derûdora wê di nava sê hêzên ji hev cihê de dibe cihê şer û pêvçûnan. Yek ji van tirk in û di bin pêşengîya Mustafa Kemal de doza Mûsil û Kerkûkê dikan. Hêza din jî Îngîlîz in ku piştî şerê cihanê yê yekemîn Iraq dikeve bin desthilatdariya wan. Hêzeke din jî di vê serdemê de hêza kurdan e ku di bin pêşengîya Şêx Mehmûd Berzencî de doza serxwebûnê dikan. Ev rûdanên sîyasî di nava rewşenbîr û gelê kurd de jî xwe dide nîşandan. Cemil Saîb jî ji van kesan e ku serê xwe bi vê meseleyê êşandîye. Di vê serdemê de rojnameya *Jîyanewe* di bin berpirsîyarîya Cemil Saîb de bi propaganda hukumranîya Îngîlîzan ve derdikeve pêş. Ne tenê nivîsên Cemil Saîb; li ser vê babetê di rojnameyê de gelek nivîs derdîçin û di van nivîsan de jî dostanîya Îngîlîzan ya li hemberî kurdan tê vegotin.

Piştî şerê cihanê yê yekemîn piranîya Iraqê dikeve bin hukumranîya Îngîlîzan. Bajarên kurdan yê wek Silêmanî, Kerkûk û Mûsil ji van bajaran in. Di vê serdemê de Şêx Mehmûd jî li Silêmanîyê niştecîh e. Şêx Mehmûdê Hefîd yan jî bi gotineke din Şêx Mehmûd Berzencî di çiriya paşîn ya 1918an de ji aliyê nûnerê Îngîlîstanê yê Iraqê Major Noel ve weke hukumdarê Kurdistanê tê îlankirin (Hilmî, 2010: 47). Lê fikr û ramanên Îngîlîzan û yê Berzencî gelek ji hev cihê ne. Di sala 1919an de gengeşiyên navbera Îngîlîz û Berzencî dibin sedema şerekî û Berzencî t êk diçe û di heman salê de jî hêla Îngîlîzan ve tê sirgûnkirin û ev rewş heta sala 1922an berdewam dike. Berzencî dîsa bi destûra Îngîlîzan di sala 1922an jî sirgûnê vedigere û li Silêmanîyê dibe serokê hukumeta kurdan. Lê vê carê jî hukumdariya wî zêde dom nake û di tîrmeha 1924an de mecbur dimîne û jî Silêmanîyê derdikeve (Bayrak, 2014: 22-23).

Cemil Saîb wek me li jor jî diyarkirî ne bi mebesta çîroknûsîyê ji bo dijberîya Şêx Mehmûd Berzencî ev metna hanê nivîsandî ye. Dibe ku tekane mebesta nivîskar jî reşkirina desthilatdariya Berzencî be. Li gorî Maruf Xeznedar du pismamên Cemil Saîb jî hêla hêzên Berzencî t ên kuştin (2024: 33). Haşîm Ahmetzade jî dîyar dike ku mirovên Cemil Saîb yê hatine kuştin yek birayê wî Arif Saîb e û yê din jî hevaleyê wî yê nêz û xwezûrê wî ye. Arif Saîb bi tawanbarîya sixurîya Îngîlîzan t ên kuştin (2018: 107).

Cemil Saîb heta hejmara 37an di rojnameya *Jîyanewe* de wek berpirsîyarê rojnameyê dixebite. Ji bilî meseleyên şexsî dijberiyek din jî di navbeyna Şêx Mehmûdê Berzencî û Cemil Saîb de heye ku ew jî helwesta Cemil Saîb ya polîtîk ve pêwendîdar e. Rojnameya *Jîyanewe* bi propagadaya îngîlîzan ve t ê naskirin. Rojname bi awayekî aşkera piştevanîya Îngîlîzan dike û dixwaze kurd jî di bin jêrdestîya Îngîlîzan de mafê xwe yê sîyasî û civakî biparêzin. Cemil Saîb rojnameyê taybetî jî ji bona vê yekê terxan dike (Arif, 2011: 16). Di vê serdemê de nerazîbûnên li hemberî Şêx Mehmûd Berzencî pir in. Ji ber ku Berzencî di desthilatdariya xwe de piranî cih daye mirovên xwe û xelk jê aciz bûye. Xelkê Silêmanî û Kerkûkê bertek nîşan dane û zêdetir jî di nava mirovên xwende de ev yek nehatiye pejirandin û desthilatdariya Şêx Mehmûd Berzencî cih cihan hatiye rexnekirin (url-1). Ev yek di bîranînên Refîq Hilmî de jî bi heman awayî cih digirin. Hilmî jî dibêje, dema Şêx Mehmûd Berzencî bi alîkarîya Îngîlîzan li Iraqê desthilatdariyê destdixe, di karên rêveberîyê de piranî mirov û dostên wî t ên wezîfedarkirin (2010:46).

2. Helwesta Rexneyî û Sîyasî “Di Xew De” ya Cemîl Saîb de

Berhema Cemîl Saîb a çîrokî ku piştire weke “Le Xewma/Di Xew De” nav daye, di navbeyna salên 1925-1926an de di rojnameya *Jîyannewe* de 18 tefrîqa û di rojnameya *Jîyanê* de jî weke 5 tefrîqa û bi tevahî 23 tefrîqa weşiyaye. Çîrok di van rojnameyan de bê nav bê nasnav derçûye. Çîrok herî dawî hejmara *Jîyanê* ya 29ê tîrmeha 1926an weşiyaye û di vê hejmarê de herçiqas di dawîya çîrokê de ‘navber’ hatibe nivîsîn jî di hejmarên pişt re yên rojnameyê de em li rastî berdewamiya çîrokê nayên (Arif, 2011: 14-15). Metna çîrokê piştire ji aliyê Cemal Baban ve di sala 1975an de ji destnivîsên nivîskar weke pirtûk hatîye weşandin (Shakely, 1998: 26). Ev metin di edebiyata Soranî de yekemin metna çîrokî ye (Reşid, 2005: 10).

Dema li gorî van nihêrînên li jor em metna Cemîl Saîb binêrin ev yek baş tê dîtîn ku Saîb ne ku armanc dike xewna xwe binîvîse. Armanca wî ew e ku serdema Şêx Mehmûd Berzencî li gorî xwe reş û tarî bide pêş û wê serdemê teşhîr bike. Bi mebestekî polîtîk ev metin hatiye nivîsîn. Cemîl Saîb meseleyên xwe yên şexsî bi rêya vê çîrokê dide der û ev yek jî di çîroknûsiya kurdî de cîyawazîyekê din dide vê metnê. Lewra di vê çîrokê de diyardeya herî sereke problemên şexsî ne (Filiz, 2023: 10). Ger em metna Cemîl Saîb binêrin em ê bibînin ku tiştê ku derdikeve holê ya herî sereke mebesta nivîskar e. Nivîskar bi metna xwe ve li gorî xwe serdemekî dide nîşandan. Rexneya serdemekê bi rêya metna xwe dide der. Gelek nivîskar jî vê çîrokê bi heman awayî pênase û şîrove dikin. Li gorî Huseyn Arif; çîroka “Le Xewma” her çend wek çîrokeke edebî bê naskirin jî ew di heman demê de metneke dîrokî û sîyasî ye jî (2011: 15). Lewra em dibînin nivîskarê çîrokê naveroka metna xwe bi rexneya bûyerên serdemê ve ristîye. Herçend çîrok bi şêwazeke sembolîk hatibe nivîsandin jî em bi gelek şahidî û belgeyên serdemê ve dikarin bejin, çîrok paşxaneya xwe ji rûdanên sîyasî yên vê serdemê wergirtîye. Herweha Haşîm Ahmetzade û Marûf Xeznedar jî gotinên Huseyn Arif piştrast dikin. Ferhad Shakely di vê babetê de tevli nîqaşê dibe û vê rewşê îronîk dibîne. Lewra Shakely rêbertî û desthilatdariya Şêx Mehmûd Berzencî di serdema modern a kurdan de weke qalîtiya xweser a yêkemîn binav dike. Di vê babete de şayesandin û dijberîya Cemîl Saîb; li gorî Shakely tiştê îronîk e (1998: 27). Ji bona zelalbûna vê serdemê şahidîyên Refîq Hilmî jî giring bûn. Ji bona analiz û piştrastkirina çîrokê cih cihan me biranînên Refîq Hilmî wek referans hilgirtin. Gotin û referansên Refîq Hilmî ji bona xebata me cîyekî taybetî digire. Lewra Refîq Hilmî ne tenê şahidê serdemê heman demê de yek ji nêzîktirîn mirovê derûdora Şêx Mehmûd e. Hilmî di serdema Konferansa Parîsê de li Silêmanîyê ye û nameya ku li ser navê Şêx Mehmûd Berzencî û giregirên kurdan ji Şerîf Paşa re hatîye nivîsîn bi destê wî tê amadekirin (Hilmî, 2010: 50).

Vegêrê çîrokê di sere metna xwe de diyar dike; ya ku ew vedibêje xewna wî ye. Çîrok li ser çar beşan ve hatîye dabeşkirin. Beşa ewil “Xwedê bi xêr bike” ye. Vegêr bi mebesta bidestxistina aboriya malbata xwe bi tevî karwanekê ber bi bajarekî ve rê dikeve. Vegêr vî bajarî weke bajarê Îslamê pênase dike. Herçend di rê de li hemberî êrîşên çete û qaçaqçîyan bîn jî di dawîyê de xwe digihînin bajêr. Li bajêr dergevanên bajêr wan radiwestînin û dixwazin her çî awayî be bacê ji wan bistînin. Dema ku dor tê vegêr û li ser wî pere dernakeve wî bi qesta casûsiyê digirin. Lê piştî hin hîvî û lavahîyên karwanîyan ew wê şeve li xanekê dimîne. Piştî roj hiltê mirovên ewlehiyê wî digirin û dibin ba yekî payebilind. Bi biryara wî vegêrê çîrokê dixin odeyekî. Ev cih di çîrokê

de di bin sernavê “Min di wê odeyê de çi dîtî?” hatiye nivîsîn. Ev ode cîyekî pir taybet e. Lewra odeyekî din jî rex vê odê heye û li wir jî mirov ji saloxdayînên vegêr tê digihîje ku hin jinên payebilind di vê odeyê de civîyan e. Li rexê alîyekî odê jî pencere hene û vegêr di vê derê civînên ku çêdibin guhdarîya wan dike. Dengên ku odeya jinan de tîn bihîstî de qala zêr, mucewher û hin tiştên bi qîmet tîn kirin. Jinên ku li wê derê ne hemû van tiştan layîqê jinekî li nav wan de runiştîye dibînin. Ew jin jî bi awayekî xwe bawer dema behsa zêrê jineke din bê kirin ew bi pozbilindî dibêje ku ew tiştên bi vî rengî mafê wê nin. Dengên ku li odeya jinan de tîn bihîstî de vegêr me pê dide hesandin ku piranî ew jina payebilind hemû tiştî ji xwe re rewşa dibîne. Dîsa gelek kes tîn li wir ji dost û nasên xwe re doza karmendîyê dikin. Hin mirovên ku hatine girtin bi destê wê jinê tîn berdan. Di vê odê de tenê em dengê wan jinan dibihîsin em reng û rûyê wan nabînin. Li alîyê din de jî kesayetê heye ku di çîrokê de weku “mezin” tê binavkirin li ser sîyasetê û rewşa welat di nava hewldanekî de ye. Her carê komek radibe û komek din pê re rûdine. Di nava van koman de yek jî koma melayan in ku li gorî fetwaya wan kesên ku dijberîya vî zîlamî dikin weku kafir tîn binavkirin û hewceye mal û jinên wan, ji wan bîn standin. Komên ku tîn bi mezin re dicivin Îngiliz û Tirk jî di navê de ne û her yek ji wan dixwaze ‘mezin’ li ser rêya wan bimeşe. Lê axaftinên ku li wir tîn kirin vegêrê çîrokê heyirî dihêle û di dawîyê de dema ku ‘mezin’ dibêje ez ya yekî jî nakim û ez ê bes ya xwe bikim; vegêr bê hemdê xwe dikene û pê dihesin ku axaftinên wan hatine bihîstî lewra li vegêr tîne xezzebê û jê dipirsin ka gelo çi karê wî di wê odeyê de heye. Wî bi karê casûsiyê pênase dikin û lê didin. Çîrok di vê derê de dawî dibe. Em hay pê nabin ka gelo vegêr ji xewê hişyar dibe yan na.

Rita Felski edebîyatê tiştêkî sûdgir dibîne û li gorî wê yek ji mebesta afirandina nivîskar sûd e (Felski, 2016:17). Ger ji vê hêlê ve jî lê binerin em dê bibînin ku Cemil Saîb bi mebestekî sûdgir rexneyên xwe bi rêya vê çîroka xwe anîne ziman. Lewra em nikarin bibêjin ku mebesta nivîskar a sereke nivîsandina çîrokê ye. Ji xwe tekane metna nivîskar ev çîrok e û heta vê gavê em li rastî berhem yan jî çîrokek din ya nivîskar nehatine. Ji xeynî vê yekê jî ew di metna xwe ya ku di rojnameyê de derdixe navê xwe li ser nenivîsandî ye. Saîb bi rêya vê çîrokê serdemekî bi çav û helwesta xwe ve derdixe pêşberî xwîneran. Cemil Saîb bi vê metna xwe ve li pey hisabdîtinekê ye. Ev hisabdîtin li hemberî Şêx Mehmûd Berzencî ye. Ji ber ku mirovên Saîb bi destê alîgirên Şêx Mehmûd ve hatine kuştin. Ew desthilatdarîya Berzencî bi awayekî reş û tarî dide şayesandin. Nivîskar da ku rexneyên xwe bîne ziman serî li edebîyatê daye û ji edebîyatê sûdwerirtîye. Sûdwerirtîna nivîskar di vê berhemê de teşhîrkirina serdemê ye. Nivîskar di destpêka çîrokê de bi xwîneran dide dîyarkirin ku xewnek dîtî ye. “Şevêkê di xewnê de ez rastî bûyereke nedîtî hatim.” (r.7) Ev xewn li gorî ragihandina vegêr xewneke tirsnaq û tehl bûye. Rewşa vegêr rewşeke xirab e. Sir û seqem e û serpayîzeke dereng e. Bi vî avayî jî vegêr hem rewşa xwe dide dîyarkirin û hem jî rewşa demsalê nîşan dide. Rewşa demsalê û rewşa vegêrê çîrokê dişibin hev. Tê da hêvî yan jî germahîyek nîne.

Vegêrê çîrokê bi qesta dabînkirina jîyana zarokên xwe qesta seferekî dike. Sefera vegêr jî ber bi welatekî din e. Ku nivîskar wî welatî weke welatê Îslamê pênase dike. “...xwedê lêanî û ez rabûm min berê xwe da ber bi jor û min got ew welatekî Îslamê ye. Li wir misilman û kesên baş zêde ne, alîkarîya hevûdu dikin” (r. 8). Lê di rê de vegêr li rastê gelek astengîyan dimîne. Ji

alîyekî ba û baran û serma ji alîyê din ve jî çete û eşqîya derdikevin ser rêya wan û dixwazin wan bişelînin. Nivîskar bi vî halî herêmê weke cîyekî nearam dide pêş. Vegêrê çîrokê di serê destpêkê de qala bajarê Îslamê dike. Lê em di dawîyê de pê hay dibin di vê derê de îronîyek jî heye. Lewra bajarê ku weke cihê aramî û selahet û şaristanîyê tê şayesandin ne bajar e. Ji ber ku piştê em rûyekî bajêr yê dijberî vê hizra vegêr re dibin şahid. Nivîskar vê rewşê bi deve vegêr bi vî awayî dide der: “ez ji bo pirça serî hatibûm min simbêl jî ser de da” (r.16). Ev hevok tam jî rewşa vegêr dişayesîne. Lewra vegêr bi qesta dabînkirina aborîya jin û zarokên xwe hatibû, lê ew hîn di serî de li rastî tiştên cuda tê. Ew êdî qezanca ku li bajêr bidest bixe wêdetir tenê ji hêvîya wî ew e ku ji vê zulmê xelas bibe: “Biraderê karwançî got, ew mirovekî xerîb e, ji germîyan hatiye û dixwaze li vir kesp û karekî bike, feqîr e, bêdesthilat e. Wan gotin, helbet tiştêk di bin sere de heye. Hebe tunebe ev casûs e, wî ji bo fêlbazîyê xwe kiriye vî halî.” (r.14).

Wek ji metne jî em dibînin casûstîya vegêr an jî helwesta dergevanan ber derîyê bajêr destpê dike. Vegêr bi her awayî rewşeke pir tarî raberî xwîneran dike. Lehengê çîrokê bi vî awayî li rastî tadeyê tê û di dawîyê de jî bi hinceta caûsûtîyê dixwazin wî bigirin. Mirovên dergevan di çîrokê de mirovên bêinnsaf hatine şayeskirin. Armanca wan ya sereke ew e ku ji herkesî pere bigirin. Tawanbarîya casûstîyê jî ji bona vê yekê bikartînin. Nivîskar di destpêka rêwîtiya xwe de çawa ku atmosfereke nexweş şayesandibû; herwiha di berdewamîya çîrokê de vê helwesta xwe qet naguherîne. Ji her alî de dixwaze vê rewşa nexweş li ber çavên xwîneran şênbertir bike. Piştî hin xireciran vegêrê çîrokê şeva xwe di xanekî de derbas dike. Vegêr vê carê jî hem rewşa xwe ya xanê dide pêş û hem jî rewşa derdûdora xwe vedibêje. Ji bona van agahîyan û şahidîyên xwe bide pejirandin xwedîyê xanê jî dike şahid: “Min guhê xwe dayê, li nêzik ji malekê girîn, lorîn, zarîn û hawar dihatin, lê çi deng, te digot guleyek berdanê. Wekî tu ava kelandî texî ser mêlaka min, dile min şewitand. Min xwe jibîr kir.” (r.19). Vegêr şahidîyên xwe yê xanê jî bi vî şiklî dide der. Ji ber ku bavê wan zarokan hatîye kuştin zarok û dayîka wan bi dengê bilind digirîn. Ev yek ji bona vegêr tiştêkî derasayî ye û ji van şahidîyên xwe şaş dimîne. Lê pişt re me pê dide hesandin ku ev tiştên vî awayî diqewimin li vî bajarî tiştên rêzê ne. Vegêr di xanê de bi heman awayî şahidîyek xwe ya din jî dide der:

“Hew min dît li milê din ê xênî denge teqîna tivingan, hawar û gazî bilind bû. Dengê çend guleyan hatin, bû qajewaj, girîn, gazî û hawar. Cardin min xwe negirt û ez derketim derve û min guh dayê. Herçî zarok û jinik bûn, li wî milî bi girîn diaxivîn., hêvî û lava dikirin. Vê carê jî min ji xançî pirs kir û jê re got, gelo ev çi ye, vê carê çi bûye? Ez çi dizanim birader, eger ez bersiva van hemî pirsên te bidim, lazim e ez bi tu tiştêkî ve mijûl nebim û kesp karekî nekim, tenê bersiva te bidim. Şev û roj sed tiştên wiha li vir diqewimin.” (r. 21).

Tiştên ku vegêr li xanê dibe şahid tiştên ne ji rêzê ne. Kuştin, hawar û qêrîn e. Lê tiştê balkêş ew e ku ev tiştên ku dibin êdî ji kesekî/ê re xerîb nayên. Hemû kes hînê vê yekê bine. Nearamî, kuştin, talan û bêdadî tiştên ji rêzê ne her roj diqewimin. Ji xwe ev rewşa vî awayî dema ku cara ewil çîrok di rojnameya Jîyannewê de derdîçe di wir de ev rewş wiha hatîye vegotin: “Ji alîyê kesekî ve xewneke ecêp û balkêş hatîye dîtin. Di wê xewnê de jîyan û rêvebirin û raborîya çend salên vî welaî cih digirin. Gelek nihênîyên xwînavî û wehş di vê xewnê de cih digirin. Herweha ev xewn gelek rewşên taybet yê hin kesan dertîne pêşberî alemê” (Arif, 2011: 14).

Di çîrokê de tê dîyarkirin ku zordarîya desthilatdaran li her derê ye. Zulmekî mezin civak hingaftîye nava xwe. Li seranserê metne de em qet li rastî bûyereke xweş nayên. Ev rewşa awarte ji xwedîyê xanê; ya ku vegêrê çîrokê lê mêhvan e ecêb nayê. Lewra ji gotinên wî em tê digihîjin bûyerên ku diqewimin û ji vegêr re bi seyr tîn êdî di wî welatî de tiştên ne xerîb in. Vê rewşa awarte xwedîyê xanê ji vegeerê çîrokê re wiha vedigerîne:

“Axir te tiştên wiha nedîtine, ji ber vê tu pirsra hemî tiştî dikî, hê tu hîn nebûyî. Xwedîyê vê malê, ez nizanim, va ye çend roj e li ser casûsî masûsîyê hatiye girtin û di feleqeyê de ezî-yetek zêde lê hatiye kirin û piştre cezayek giran lê hatiye birîn. Ew jî pereyên wî tunebûne ku bide û xanîyê xwe firotiye, lê têra beşa cezayê wî nekiriye. Niha bi xwe jî di hepsê de ne. Lê çi heye, diz hatine ser mala wî feqîrî û ew çend kelûpelên tê de hebûne jî birine. Niha tu dibînî, tiving jî berdidin wan, eger zarokên wî nehatibin kuştin jî baş e. Min pirs kir, ev hemî casûsiya liv ir çi ye? Biraderê xançî sere xwe hejand, ecêb ecêb li min nêrî û hinek b imin kenî û got: Bavê min, ev nexweşîyêke dibe herkes bigre. Tu xerîbî î te hê nedîtiye. Lê meraq neke u ê jî bibînî.” (r.21-22).

Li gorî Feridun Andaç nivîs pişta xwe dispêre bîranînan û ew di vî warî de payeyekî giring dide bîranînan (2008: 113). Ji vê pasaja jor jî dîyar dibe ku casûsî mîna heyûlayekî li pey herkesî digere. Xwedîyê xanê vê yekê dişibîne nexweşîyêke ku divê herkes vê nexweşîyê bigire. Ev nexweşîya casûsîyê di seransere çîrokê de xwe dide der. Em vê tawanbarîya casûsîyê di jîyana nivîskar de jî dibînin. Wek li jor jî hate dîyarkirin birayê nivîskar Arif Saîb bi hinceta casûsiya Îngîlîzan hatibû kuştin. Loma jî em dibînin lehengê çîrokê jî bi vê tawanbarîyê tê desteserkirin. Ne tenê vegêrê çîrokê herwiha hin kesên din jî bi vê hincetê tîn girtin û nivîskar jî vê rewşê weku nexweşîyêke belavbûyî pênase dike. Dikare bê gotin ku hin trawmayên pêşerojê bandorê li fikr, raman û jîyana mirovan dike. Mirov nikarin xwe ji vê yekê xilas bikin. Pêşeroj her tim di paşerojê de bibandor e. Freud vê yekê bi trawmayan şer re rave dike. Li gorî Freud trawmayên di şer de piştre li ser xewnan bibandor in. Kesayetên ku di şer de bûyerên trawmatîk jîyane di xewna xwe de jî tiştên trawmatîk dibînin (2019: 70).

Wek me li jorê jî dîyar kiribû mebesta nivîskar ya sereke teşhîrkirina serdemekî ye. Ew hemû awayan li pey vê mebesta xwe ye. Di metna çîrokê de bi devê vegêr şahidîyên herî mezin di beşa “Min di wê odayê de çi dîtin?” de hatine dîyarkirin. Lewra di vê derê de şahidîyên vegêr digihîje lûtkeya herî bilind. Ev odayêke taybet e. Ji alîyê nivîskar ve bi hostatî ev der hatîye hîlbijartin. Ger em vê metnê weku metneke xewnê pênase bikin atmosfera vê odê dişibe xewnê. Lewra ancax di xewnekê de odayekî vî awayî bê pênasekirin. Ji ber ku di vê odayê de dê hem rewşa malbata mirovê ‘mezin’ û hem jî dê di kesayetîya ‘mezin’ de rewşa rêbertîya serdemê bê şayesandin. Di metna çîrokê de herçend nehatibe aşkera kirin jî ji helwest û wesfên ‘mezin’ em tê derdixin ku ev leheng Şêx Mehmûd Berzencî bi xwe ye. Herçend vegêr desteser be jî ev cih qet naşibe zindanekî yan jî girtîgehekê. Lewra di vê derê de bi tena sere xwe dimîne. Ev der firsendê dide vegêr ku rewşa derûdora xwe bi du alîyan ve ber çavan raxîne. Vegêr ji alîyê wê odayê de hem guhveçîna axaftinên jinan û alîyê jî guhveçîna civînên li alîyê din pêk tîn dike. Nivîskar di wê odayê de bi rêya vegêrê çîrokê mîna derhênerekî şanoyê tevdigere. Berîya ku dest bi gotinê bike di çîrokê de bi serenavan mebesta xwe dide dîyarkirin. Xwîner tavilê pê dihesin ka dê di wê beşa da çi pêk were. Kesayetên ku qal dike mîna listîkvanên şanoyê li ber çavên temaşevanên şanoyê dide cihki-

rin. Vegêr jî pişt perdeya şanoyê rewş û tevgera lehengan ji xwîneran re vedigêrîne.

“Ez rabûm û hêdî hêdî çûm ber pencereyên ku bi ser odeya jinan de bûn. Ez li wir sekinim û min guhê xwe da axaftinên wan û min bi tamamî hemî gotinên wan seh dikirin, lê çavên min li tiştêkî nebû û min guhê xwe dida gotinên wan. Ji bilî behsa zêr, mucewher, kincên xweşik û ew gotin nebe, carekê tiştêkî din li ber guhê min neket. Dengê dihat digot: Qurban jina filankesî cotek guharên wê yên gelek antîke hene, wê salê mêrê wê ji Stembolê jê re anîye. Sê rêz elmas tê de hatine bicihkirin, dibêjin li wir bi sedûpêncî lîreyan kiriye, lê qîmeta wê nayê gotin, bi Xwedê ew tenê li te tê, tu wê ji xwe re jê bistîne. Wê jî digot, ez ê sibê zû bişînim bale, bi camêrî be yan zorî ez ê jê bistînim. Ew tiştên wiha ji bo wê çî ye, bila wê bêyî pere bide min.” (r.37).

Ger mirov bi şêwaza Freud li meseleyê binêre dê metna jêgirtî çêtir bê zelalkirin. Li gorî Freud xewn arêzûyên mirovan dihewînin. Di vê metna jêgirtî de jî em dibînin ku nivîskar bi hemû awayan wêneyeke negatîf diwefîne. Vê yekê ne tenê di şexsiyeta Berzencî de malbat û derûdora wî jî bi awayekî negatîf afîşe dike. Nivîskar ji bo derbirîna kerba dile xwe bi her awayî tevdigere. Vegêrandinên wek li jor gelek tîr bihîstin. Ew jina ku dîyar e xwedî hukmekî ye her tiştî ji xwe re layiq dibîne. Ew layiqê wan hemû zêr û zîvan e. Lê ne mimkune kesekî din bibe xwedî tiştêkî giranbiha. Di çîrokê de Cemîl Saîb qala malbatekî dike ku em pê agahdar in ku ev malbat di wê derê de xwedîyê desthilatdarîyê ye. Jinên wan bi xeml û xişrên xwe ve tîr naskirin û dema ku çav berdine xişrên jineke din teqez bi hincetekê jê werdigirin. Ev yek di bîranînên Refîq Hîlmî de jî hatine dîyarkirin. Piştî ku Şêx Mehmûd Berzencî weke qralê Kurdistanê tê naskirin derûdora wî di nava rewşeke wiha de dide naskirin. “Her yek bi navê tiştêkî maaş, berat û pêwistîyên wan hatin tespît kirin. Xulam bi xenceran ve dayîk û xidam bi germîya xişrên xwe ve ketin nav pozbilindîyê. Şarwal û miradxanî, poşî û egalên bi sûrme, hevrişmên şêxan û derûdora wan, dîmenek din dabûn Silêmanîyê.” (2010: 48).

Di wê odeya jinan de ne tenê qala zêr û tiştên biqîmet tîr kirin. Ew der hem ji bo bidestxistina karekî dewletê jî dibe cihê serîlêdanê û hin caran jî em dibînin li şûna dadgehekê tê şayeskirin. Lê ev tiştên vî awayî jî bi rêya rişwetê tîr kirin. Ev yek di çîrokê de weha hatîye vegêrandin:

“Piştî vê, ez guh lêbûm yeka din derket ortê û got, qurban filankesî topek mehfûrê yêmenî û du hevrişmên sûrmey yên gelek sipehî ji we re anîne. Dibêje, em xizmetkarê vî derîyê han bûn, kurê min heta niha tutinfiroş bû û cixare difirotin, niha ew bêçare ye û gelek destteng e, wî xwe avêtiye ber vî dergêhî ku hûn emir bikin kurê wî bikin zabit.” (r.38-39).

Rewş di girtin û berdana hin kesan de jî bi heman awayî ye. Vegêr dîsa ji gotinên wê jinê vedigêrîne ku ew dikare girtîyan ji girtîgehê derîne. Ev yek dîsa bi bertîlekî yan jî bi hin dîyarîyan çêdibe. “Bi awakî din jî jê re got barek birinc, tenekek ron û eyarek penîr jî ji midbexê re anîye û pênc-deh lîre jî ji bo xizmeta we şandiye. Dema ku xanimê vê seh kir, got, çawan hepis kirine? Ew yê me bû, bi qebra bavê min ez qebûl nakim, a niha dê filankes biçe û beje derhal serkar filan bê berdan...destê wê mirç maçî kir û çû.” (r. 40).

Vegêr di wê odeya ku tê de desteser e berê xwîneran an jî em dikarin bibêjin berê qemereya xwe dide alîyê din ku li wê derê bi saloxdayînên vegêr em pê dizanin ku ‘mezîn’ lê rûniştîye û bi

hin komên cuda re hevdiînan pêk tîne. Nivîskar dîsa vê derê bi serenavekî nû dest bi vegêrandinê dike û tiştên ku dê biqewimin xwîneran pê dide hesandin. Nivîskar di beşa “Giftûgokirin û fetwa wergirtin, bicihanîna emran, meseleyên siyasî” de civînên ku li derûdora ‘mezin’ pêk tên vedigerîne. Lê herçend bi komên cuda re hevdiînan pêk bîne jî ew di dawîyê de gotina xwe bi cih tîne. Nivîskar dide dîyarkirin ku ew ne ji bona gel ji bona berjewendîyê xwe vî karî rabûye.

“Pişt re xwe bi bi xwe dest bi axaftin û sohbeta kir û pişt re jî mezin got: Ev gotin hemî li ba min henek û laqirdî ne, ez ji ber çî ji bo vî xelkî tuşî eziyet û derdeserî bibim, tiştê qezenc û xêra min tê de nebe ez nakim. Ez heta perekî zêde nedeynim ser hev, di babet û kar û barên xwe de dile min rehet nebe, ez yekê ji van nakim.” (r.83).

Refîq Hilmî ne tenê derûdora Şêx Mehmûd herweha Şêx Mehmûd Berzencî jî yekî ehlîkêyf dide nîşandan. “Hukumdarê Kurdistanê jî li gor wê hewayê dimeşiya. Bi roj bi revdên xuleman û derûdora xwe re berê xwe dida Deşta Kanêskanê û bi seyran, henek û kêf rojên xwe derbas dikir. Bi hêvî bû ku ev dem heta hetayê bi vî awayî bimeşe. Xwedê bi qudreta xwe dê Kurdistanê mezin jê re çêke û ew jî taca hukumdartîyê dayne serê xwe!!” (2010: 49). “dema ku Îngîlîz bi tevayî damezran û ciyê xwe girtin, şarezayê hemî milê eşîratî û xelkên din ên welat bûn û û bi taybetî bi tebî’etê Şêx Mehmûd baş şareza bûn, ji wan re derket ku plan û programeke wî ya ji bo rojên bî tune û tenê rojane dijî.” (Hilmî, 2010:59). Ji van agahdarîyên ku Refîq Hilmî dide, em pê haydar dibin ku plansazîyê Şêx Mehmûd Berzencî tune ye. Ne yekî pêşbîn e û lewra jî di warê pêşketinê de rolekî sereke nikare bîne cî. Herweha jî dikare bê gotin ku di ragihandinên Hilmî û çîroka Cemil Saîb de ji gelek alîyan ve hevêlîyek derdikeve holê.

Encam

Di vê nivîsarê de me di çarçoveya rexneya sîyasî de pêwendîya edebiyat û xewnê şîrove kir. Xewn û xeyal di vê çîrokê de tevli hev dibin. Him xewn heye û xeyal jî pê re ye. Xeyal ew e ku xwe bigihîne bajarê û rewşa xwe ya aborî baş bike û risqê zarokên xwe dest bixe. Dema behsa bajarê Îslamê tê kirin di vê derê de îronîyek jî heye. Di eslê xwe da Îslam bi edelatê ve tê naskirin. Bajarên Îslamê bajarên edalet heq hukuqê ne lê di vê derê de cîyê ku lehengê çîrokê wek bajarê Îslamê nav dike û tişte ku rûbirû dimînê ji tesewura Îslamê dîr e. Di çîrokê de nivîskar tiştên ku binhişê wî de mayî derdixê holê. Nivîskar bi vê xewna xwe ve şahidiya serdemekê dike. Ger em ji rêbaza Freud li meseleyê binêrin, nivîskar bi riya vê çîrokê arezûyên xwe tetmîn dike. Di vê derê de jî ji bo nivîskar arezû, îfşakirina serdemekî reş û tarî ye. Nivîskar bi rêya çîrokê çiqas gilî û gazindên wî hebin yekûyek eşkere dike.

Cemil Saîb di metna çîrokê de bi rêya vegêr weke rêzefilmekê sehneyan vedigerîne. Di nava vê vegêrandinê de bi xwîneran dide nîşandan ku kesê ku desthilatdarî di dest de ye mirovekî baş nîne. Di çîrokê de em li rastî navekî nayên ew bi kirinên xwe ve cih digirin. Ji çîrokê jî dîyar dibe ku kesê ku nivîskar weke mezin dîyar dike Şêx Mehmûd Berzencî ye. Nivîskar bi vê metna xwe ve meseleyên xwe yê şexsî anîne ziman. Nivîskar her çend xwestibe nasnameya xwe di metna çîrokê de bide veşartin jî bi helwesta xwe ve vê yekê nikare pêk bîne û helwesta xwe ya sîyasî bi awayekî aşkera dide der. Lewra vegêrê çîrokê rasterast bi zimanekî tawanbar hemberî rewşa

awarte bi kar tîne. Hal û rewşa tê de bi awayekî derasayî tîne ziman. Lê tiştêkî xerîb jî ew e ku di derdorê de bûyerên ku diqewimin weku tiştên rêzê tîn dîtin. Di çîrokê de du rewş derdikevine pêşberî xwîneran. Yek jî van rewşa desthilatdaran e ku bi awayekî zordarî civak hingaftine bin hukmê xwe. Ya din jî rewşa mirovên din e. Ew pir hêsanî dikarin bên girtin û kuştin. Zordest li ser wan tîn xezebê û di nava rewşeke xirab de tîn vegêrandin. Çîrok di çiyekî de hîn bûyer berdewame ji nişkav de diqede û nagihije tu encamekî. Em pê nahesin ka gelo vegêr ji vê kabûsê şîyar dibe yan na. Di çîrokê de ne tenê rewşa polîtîk heman demê de hawirdor jî tim bi çavekî bedbîn tê ravekirin. Wek encam jî dikare bê gotin ku di seranserê metna çîrokê de dorhêl jî tim weku; payîzakê sar, rêwîtiyekê bi halekî perîşan sir û seqemê tê ravekirin. Em li rastî rojekî xweş nayên.

Çavkanî

- Ahmetzade, H. (2004). *Ulus ve Roman*. İstanbul: Perî.
- Andaç, F. (2008). *Öyküyü Yazmak Öyküyü Düşünmek*. İstanbul: Doruk
- Arif, H. (2011). *Çîrokî Hunerî Kurdî (1920-1960)*. Hewlêr: Aras.
- Aslanoğlu, Ö. (2017). Aristoteles'in Rüya Teorisi ve "Rüyalar Üzerine" Adlı Eserinin Çevirisi. *Üsküdar Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 4, 139-173.
- Bayrak, M. (2014). *Güncelliğine ve Önemine Binaen: Musul-Kerkük Kimin Yurdu?*. Kürt Tarihi, 14, 14-25.
- Cayce, E. (1998). *Rüyaların Dili*. (Çev. Acar Doğangün). İstanbul: Arıtan.
- Çelebi, İ. (2008). Rüya. İstanbul: TDV, C. XXXV, 306-309.
- Çıkla, S. & Kuran Büyüksavaş, Ş. (2021). *Metin Tahlilinde Yeni Yaklaşımlar -I-*. Ankara: Çolpan.
- Demir, R. (2022). *Ziya Paşa Namık Kemal, Rüya*. İstanbul: Can.
- Doskî, T. (2006). *Cihana Xewnan*. Hewlêr: Çapxaneyaya Rojhilat.
- Felski, R. (2016). *Edebiyat Ne İşe Yarar*. İstanbul: Metis Eleştiri.
- Filiz, M. Ş. (2013). Ji Aliyê Bîyanîbûna Mirovê Rewşenbîr ve Berawirdkirina Romana Yaban A Yakup Kadri Karaosmanoğlu û Labîrenta Cinan a Hesenê Metê. *Dilbilim Ve Karşılaştırmalı Edebiyat -Karşılaştırmalı Edebiyat-*. Mardin Artuklu Üniversitesi: Mardin.
- Freud, S. (2018). *Rüya Psikolojisi Yeni Başlayanlar İçin Psikanaliz*. (Çev: Beyzanur Doğan). Ankara: Gece Kitaplığı.
- Freud, S. (2019). *Psikanaliz Üzerine*. İstanbul: Olimpos.
- Gennadiy, P. (2014). *Edebiyat Bilimi*. (Çev: Yılmaz Onay). İstanbul: Evrensel Basın Yayın.
- Hilmi, R. (2010). *Yadaşt Başûrê Kurdistanê û Şoreşa Şêx Mehmûd*. (Ji Soranî: Ziya Avcı). Diyarbakir: Lis.
- Lescot, R. (2020). *Memê Alan*. İstanbul: Avesta.

- Özgül, M. K. (1989). *Türk Edebiyatında Siyasi Rüyalara*. Ankara: Akçağ.
- Reşid, S. (2005). *Çirokî Kurdî: Rexne û Lêkolînewe*. Hewlêr: Weşanên Kitêbî Gîrfan.
- Saib, C. (2015). *Di Xew De*. (Ji soranî: Ziya Avcî). İstanbul: Avesta.
- Shakely, F. (1998). *Modern Kürt Öykü Sanatı*. (Wer: Rohat Alakom). İstanbul: Avesta.
- Tek, Z. (2017). Düşlerin Yorumu'ndan Ziya Paşa'nın Rüya'sına: Bir Savunma Mekanizması Olarak 'Fantezi'. *Türklük Bilimi Araştırmaları*, 42, 227-257.
- Tosun, N. (2020). *Edebiyat Atlası*. İstanbul: Dedalus.
- Üstün Kaya, S. (2021). Dünya Edebiyatlarında Rüya Motifi: Karşılaştırmalı Bir Analiz. *Akademi Sosyal Bilimler Dergisi (asbider)*, 24, 449-458.
- Xeznedar, M. (2024). *Dîroka Edebîyata Kurdî*, cild V, (Ji Soranî: Ziya Avcî). İstanbul: Nûbihar.
- Url-1: <https://www.indyurk.com/node/212516/t%C3%BCrkiyeden-sesler/ortado%C4%9Fu-notlar%C4%B1-26-%C5%9Feyh-mahmud-berzenci-1>. (tarîx: 12.10.2024).